

مەلەكەن

Mem û Zîn

Mele Mehmûdê Bazîdî

پەزىزلىكەن ئەمەنلىكىنى

Mele Mehmûdê Bazîdî

Mem û Zîn

PIRTÛKXANEYA EHMEDÊ XANÎ: 25/1

Gerînendeyê Weşanê

Lal Laleş

Editor

Yaqob Tilermeni

Derhênerê Dîtbarî

Şeuer Özmen

Mîzanpaj

Lîs

Redaksiyon - Amadekarî

Mîran Janbar - Şêximûs Sefer

Çapa Yekem

Gulan 2007

Çap

Barış Matbaa-Mücellit / Stenbol

Jİ BILÎ DANASİNÊ BÊYÎ DESTÛRA

NIVISKÊR Ú WEŞANXANEYÊ

BI TU AWAYÎ NAYÊ KOPIKIRIN

ISBN

978-975-6179-31-4

© LîS

LîS BASIN-YAYIN PAZARLAMA

ORGANİZASYON REHBERLİK ve DANIŞMANLIK

Kooperatif Mah. Sanat Sokağı

Dicle Apt. No: 2 Yenişehir/Diyarbakır

Tel: +90 412 228 97 76

Fax: +90 412 228 73 30

e-mail: wesanenlis@yahoo.com

www.wesanenlis.com

# Mem û Zîn

# Mele Mehmûdê Bazîdî



Veguhestina ji Tipêن Erebî  
Xelîl Duhokî

هەوا لىنامى كېلىپ



**Mele Mehmûdê Bazîdî** • Di sala 1797'an de li bajarê Bazîdê ji dayik bûye. Bi giranî xebatên xwe bi zaravayê Kurmancî dînîvisine. Şerefnameya Şerefxanê Bedlisi ji zimanê Farisi werdigerîne zaravayê Kurmancî. Di heman gavê de, helbestan ji zimanê Erebi, Osmani û Farisi werdigerîne zimanê Kurdi.

Mele Mehmûd pirtûka bi navê "Adab û Risuma Kurdan" (Erf û Adetên Kurdan) bi zaravayê Kurmancî nivîsiye. Di sala 1860'yi de bi qasî 40 çîrok û serpêhatiyêni Kurdi wek pirtûk diweşîne. Li gor çavkaniyan di sala 1863'an de çûye ser dilovaniya xwe.

هەواڵنامەی کتىب

JI BO PIŞTGIRIYA BEŞİR YILMAZ SPAS.

هەوا لىنامەدى كېلىپ:

*Di warê zanistê de ji bo xwendinê berhemên herî nû tercîh bikin.  
Di wêjeyê de jî her timî yên herî kevin bixwînin. Klasîk her dem  
modern in.*

Amy Lowell

# هەوا لىنامەى كېتىب

# Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazîdî

مەلەپاپەنەمەدی كۆزى

Bêşik çîroka Mem û Zînê beriya Mela Mehmûdê Bazîdî, berhema nemir a helbestvanê mezin Ehmedê Xanî tîne bîra meriv.

Bi rastî jî hem nav û naveroka pirtûkên wan yek e û hem jî Ehmedê Xanî –bi eslê xwe ji Xana Hekarî be jî– mîna Mela Mehmûd, ew jî Bazîdî ye.

Cihêtî di du xalan de heye: Yek; berhema Ehmedê Xanî helbest e û ya Mela Mehmûdê Bazîdî pexşan e. Dudu; berhema Ehmedê Xanî bi qasî 120-130 sal beriya berhema wî hatiye nivisîn. Bi gotineke din Mela mîna xwendekarê Xanî jî tê hesêb.

Bêşik Mela Mehmûd di bin tesîra Ehmedê Xanî de maye, ku ev jî ne qisûr e. Hem Ehmedê Xanî û hem jî Mem û Zîn iro jî tesîrêni xwe bilhêz didomînin. Lê ev rastiyên hanê girîngiya berhema li ber destê we û ya nivîskarê wê kêm nake.

Jixwe Bazîdî, di destpêkê de qala Ehmedê Xanî dike û welê destpê dike:

“...bi zimanê Kurmancî, di tarîxa hezar û şeszedî de, di qese-  
ba Bayezîdê de, hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telîf kiriye bi wezn  
bi navê Mem û Zînê, aşiq û maşûq, li wechê muxteser beyana wan  
dike.”

Ew, ne bi tenê bi alîkariya Jaba, Ehmedê Xanî dide  
nasîn; her wiha bi rêya vê pirtûkê, berhema “Mem û Zîn”ê  
bi pexşanî diyarı gelê xwe dike.

Di pirtûkê de jî, têgehên ku hemû dinyaya wêjeyê li ser  
dilerizin, bi hemû giranî û xweşikayıya xwe hene.

“Evîn”, di dîtina pêşîn de evîn, evîna ji hesab û aqilan  
dûr, evîna saf, evîna bi mirinê re heval; “Hevaltî”, hevaltiya  
ku di rêya wê de mal tê şewitandin, mal tê wêrandin, bêyî  
ku gavekê tereddût bête kirin; “Hesret/kovan” a ku meriv roj  
bi roj dihelîne, hesreta ku meriv bi ber mirinê ve diajo, ha  
di nava zindanê de ha di nava serayê de; “Hesûdî”, he-  
sûdiya ku bi xayîniyê re bûye yek, hesûdiya ku nan hûr dike  
xwîna meriv; “Mêrxasî”, mêrxasiya ku di bêhnekê de Beko  
mîna berateyekê dişîne gorê; “Xeyal/Xewn”, xeyal/-  
xewn(ên) ku bi sedan sal in di zimanê Xanî de bi helbestî,  
di zimanê Bazîdî de bi pexşanî, di zimanê gel de bûye  
çîrok, bûye kilam bûye vegotina devkî; “Wargeh”, wargehek  
pîroz, Cizîrê û Dîcle û çiyayên ku ji hebûna xwe vir ve bûne  
nîv-xwedayên heman erdnîgariyê; “Hêvî û hêvî-şikestin”...  
“Keç û xort”... “Dawet û govend”... “Dîwan” û hikum”... “Cil  
û berg”... “Seyd û seyran”... “Qelleşî û poşmanî”... “Şîn û  
girî”... “Sebir û ders”... Tev di “Çîroka Mem û Zînê” de bi  
awayekî lihevhatî, bêyî haya meriv jê çêbibe di bin hişê  
meriv de yek bi yek cih dignin.

Lewra divê em qîmeta Nivîskar û berhema wî baş  
bîzanîbin. Lewre divê camêr û canikên ku gelek wext berê  
li ser Mela Mehmûdê Bazîdî nivîsandine, di vê pêşgotinê  
de cihê xwe bigrin.

Zanyarê Kurd û xebatkarê civakê yê bi nav û deng Mela Mehmûd Bazîdî, di sala 1797'an de li bajarê Bazîdê (Bayazîd) ji dêya xwe bûye. Di xortaniyê de wî Quran xwendîye, di nav edebiyata bi zimanên erebî, farisî û tirkî de kûr bûye û zimanên wan hê qisûr zanibûye.

Wî lêgerînên xwe yên zanyarî pêşîn li bajarê xwe kiriye, paşê jî li Tewrêzê. Bi dû rîwitiya xwe ya li Farizistanê re, ew vedigere Bazîdê, dibe serwêrê medresê û di nav hemwe-latiyên xwe de zû tê naskirin. Lê piştî ku serekê eşîra Kurdan a bi nav û deng li Bazîdê ji text tê avêtin, ew cîguhastî Erziromê dibe û li wira karê mîmostatiyê berde-wam dike. Bazîdî xwedî qedirekî bilind bûye, ji bona wê yekê ye ku navê wî li gelek mîzgeft û medreseyên bajarên cuda kirine.

Hurmîta wî di nav karmendêن dewletê yên Tîrkiya Osmaniye de jî hebû. Hikumdarên sultaniyê çend caran ew wek qasidê xwe şandine bal serekên serhildanêن Kurdan ên li wilayetên Botanê û Hekariyê ji bona ku ji wan re bikeve nava peywendiyan. Lê jê re bingehêk heye ku em bêne ser wê baweriyê ku pevgirêdanêن Mela Mehmûdê Bazîdî yên surî (bi dizî) bi serokên serhildanêن Kurdan re hebûn. Wisa xuya ye ku wî hewl dida sipartinêن hikumetê ne ku ji bo berjewendiyêن Tîrkiya Osmaniye, lê ji bo kara Kurdêن têkoşer pêk bîne.

Hikumeta Tîrkiyê destpê kir, şik bire ser Mela Mehmûd ku ew bi isyankiran ve girêdayî yc. Wî pêşîn sîrgûnî Wanê dîkin, paşê dîgrin, davêjîne zindanê, lê piştî 15 rojan berdidin. Mela Mehmûdê navdar, wek dibêjin, qedirê xwe di destê xwe de digirt û nedîhişt ku cezayeke ji wê zêdetir bidine wî. Lê dîsa jî ew ji çavê hikumetê ket. Piştî wê di nav bext û qedera Mela Mehmûd de ecêbêن giran bûn.

Di deima şerê Rûsiyayê-Tîrkiyê (salên 1853-1856) de birayê wî şehîd ket. Piştî têkçûna Tîrkiyê, kar û barê kurêñ wî ku bazirganî dikirin, her diçû xirabtir dibû. Di wan rojêñ

ji bona M. M. Bazîdî giran de, zanyar û dîplomatê ûris A. D. Jaba hawara xwe li wî dadixe û daxwaza alîkariyê jê dike. Di gulana sala 1856'an de ew dibe konsûlê Erziromê. Hema wan çaxan jî akadêmîk A. Dornê ji Pêterbûrgê ji A. D. Jaba re pêşniyar dike ku desthilatdariya xwe bi kar bîne, ji bona berhevkirin û lêkolîna materiyalên bi zaravayê Kurmancî.

Piştî sala 1856an Mela Mehmûd di hêla lêgerînên ziman, dîrok û çanda Kurdan de dibe maimoste, ronahîdar û karmendê A. D. Jaba. Ew bi alîkariya Kurdên xwende û xasma M. M. Bazîdî, gelek destnivîsarên Kurdî berhev dike û ji Akademiya Zanyarî ya Pêtersbûrgê re dişîne. Di nav wan da hinek destnivîsarên Mela Mehmûd jî hebûn ku der heqa dîrok, êtnografiya û zargotina Kurdan de bûn. Ji wê demê vir ve navê zanyarên Ûris û Kurd gelek caran bi hev re tê ser zar-zimanan û ew nav yekser bi herfîn zêrîn ketine nava dîroka Kurdzanîyê.

Di salên 1858-1859an de M. M. Bazîdî gramera Erebî-Farisî-Kurdî ya Elî Teremoxî (dawîya sedsala XVI û destpê-ka sedsala XVII) ji ber digre (kopî dike) û jê re pêşgotinekê dinivîse. Di wê de, ew der heqa jînenîgariya Elî Teremoxî de malûmatiyan dinivîse, qalâ hin zanyarên Kurd û nivîskarên gramera Kurdî dike, der heqa rola xwendina di dibistanan de li nav jiyana çandî ya Kurdistanê de tîne ber çavan.

Mela Mehmûd yek ji sê xudanêñ diyalogên bi Kurdî-Fransî ye ku berhemeye ji bona hînbûna zimanê Kurdî ye. Di wê de weke 3 hezar diyalog hene ku çend aliyêñ jiyan û debara Kurdên Tirkîyê di sedsala XIXan de tînine ber çavan. Di wê de malûmatî hene der barê erf-edet, rabûn-rûniştina Kurdan de, iżbatiyêñ dîrokî yên der heqa eşîretên Kuŕdan û tiştîn mayîn de hatine destnîşankirinê.

A. D. Jaba, ku di sala 1880'yi de karê wergera wan gotûbêja ser zimanê Fransî bi ser hev de tîne (xilas dike),

di pêşgotina wê de dibêje ku niyeta wî heye jînenîgariya alîkarê xwe yê dilsoz Mela Mehmûdê Bazîdî binivîse. Dibe ku konsûlê Ûrisan sozên xwe pêk anîbe jî, ji ber ku ew merivekî ciddî bû, lê destxcta der heqa wê yekê de negihîştiye destê me.

Hema di wan çaxan de M. M. Bazîdî bi pêşniyara A. D. Jaba pirtûkeke hewaskar dinivîse, bi sernivîsa "Rabûn-rûniştin û erf-edetên Kurda" û di wê de der heqa tîmitêla Kurdan, dem-dezgeliên wan, leyistik û sazbendiya gelêri, der heqa huner û çanda Kurdan de radixe ber çavêن xwendekaran. Ew pirtûk di sala 1963'yan bi wergera Ûrisî ji aliyê Kurdzan M. Rûdênkoyê ve hatiye çapkiranê.

Ji namên A. D. Jaba, ku wî şandiye Pêtersbûrgê, em pê dihesin ku bi hêvîkirina wî Mela Mehmûd Bazîdî wek berdewama xebata dîrokzanê Kurdan ê bi nav û deng Şerefxanê Bîtlîsi, xebateke dîrokî "Dîroka Kurda ya nû" (weke 1000 rûpel) nivîsiye. Di wê pirtûkê de dîroka weke heftê salan (ji salên 1785-1786 hetanî salên 1857-1858) ya navçeyên Kurdan ên serke dihate ber çavan. Mixabin, em nizanin ci hatiye serê wê pirtûkê. Xuya ye ku destnivîsara wergera nîvcomayî di arşîva A. D. Jaba ya Smîrnê de maye. Tenê wergera Fransî ya "Pêşgotina" wê pirtûkê hatiye parastinê ku A. D. Jaba kiriye û der heqa vê yekê de Kurdzan Y. Ğ. Vasîlyêvayê di gotareke xwe de nivîsiye.

A. D. Jaba bi Mela Mehmûd Bazîdî re tevayî koleksiyona destnivîsarên Kurdi yên herî tam û mezin (weke 50 heb) ên der heqa folklor, dîrok, êtnografiya, zimanê Kurdan de berhev kirine. Ew kolêksiyon weke 90 salan çap nebûn, hetanî sala 1957'an M. B. Rûdênkoyê ew di xebatêن Pirtûkxançeya Pêtersbûrgê ya bi navê Saltîkov-Şêdrîn de neda weşandinê û naskirinê; lê di sala 1961'ê de xebateke wê ya bi navê "Der heqa destnivîsarên Kurdi yên li Leningradê" ronahî dît.

Para koleksiyonê ya herî sereke -ew destnivîsarên

helbestvanên Kurdan ên sedsala navîn ên herî bi nav û deng Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Melayê Cizîrî, dest-nivîsarên sertaca helbestvaniya Kurdan “Mem û Zîn”a şayîrê bi nav û deng ê sedalsa XVIIan Ehmedê Xanî û yên mayîn in. Di wê koleksiyonê de, ku piranî bi hereket û hewldayîna Mela Mehmûdê Bazîdî hatiye sazkirinê, dest-nivîsarên wisa degme hene, wek em bêjin ên şayîrên mezin Harîs Bîtlîsî, Selîm Silêman, Durfişanî, Remedanî, Mûradxan Bazîdî, ku kubariya edebiyata Kurdan a klasîk in. Bi saya wê koleksiyonê em pê hesiyan ku vêrsiyonên Kurdî yên destanên “Leyl û Mecnûn”, “Yûsif û Zelîxe”, “Zembîlfiroş” hene.

Bi alîkariya Mela Mehmûdê Bazîdî A. D. Jaba cara pêsin ferhengên Fransî-Kurdî û Kurdî-Fransî û wisa jî ferhenga zaravayên Kurdî yên Hekarî-Rewandî amade kir.

Mela Mehmûdê Bazîdî di dema karkirina xwe ya herî adan de - salên 1858-1859'an- bi pêşniyara A. D. Jaba dest-pê dike “Şerefnamê”ya Şerefxanê Bîtlîsî ji Farisi werdi-gerîne Kurdî, zaravayê Kurmancî. Ew werger di hêla zan-yariyê de gelekî baldar e. Ya pêşîn, ji ber ku ew hetanî niha dîroka bi zimanê Kurdî ya tek-tenê ye. Ya duda, dest-nivîsara Pirtûkxaneya Rûsiyayê ya gelî (Pirtûkxana dewletê ya berê) de bi destê Mela Mehmûdê Bazîdî hatiye nivîsandin. Kurdzanên Pêtersbûrgê ev yek û her wiha ew jî, ku van dehsaliyên paşîn li bal Kurdan, xasma ronakbîran, daxwaza bi zimanê dayika xwe dîroka gelê xwe bixwînin rû daye, dane ber çavan û di sala 1986'an de ew destnivîsar bi cûrê faksîmîlê (teksîr) çap kirin û kirine milkê xwen-dekarên Kurdiyaxêv. Di hêlekê de jî ew fersendek e ku mîra-ta kedkarê kurdan ê sedalsa XIXan re nas bin.” (Wergera ji Ûrisî: Têmûrê Xelil. Ji “<http://www.pen-kurd.org>”ê)

Bawer dikim ev nivîs bi tenê qîmeta Mela Mahmûdê Bazîdî bi tevahî derdixe rastê. Lê li gorî nivîskariya wî, zan-yariya wî, civakheziya wî û têkoşeriya wî di nava Kurdên

Tirkiyê de gelek kêm tê nasîn.

Pirtûka wî ya bi navê "Erf û Edetên Kurdan" di sala 1998'an de ji alî "Weşanên Pêri" ve li Stenbolê, lê bi zimanê Tirkî çap bûye. Di "Notê Weşanger" de tê gotin; "Ev pirtûk heya nûha bi Rûsî (1963), bi Erebî (1972), bi Kurdi-Soranî (1981) û bi Tirkî, bi çar zimanان; çapa çaremin ji alî Weşanxana me ve çapa wê pêk hatiye."

Mîna ku di wê pirtûkê de de jî hatiye qalkirin, M. P Rudenko, ji bo Mela Mahmûdê Bazîdî dibêje ku: "Dikarim bibêjim ku gelê Kurd, di parastina gencîneya Kurd de, deyndariya Mela Mahmûdê Bazîdî, bêdawî ye. Ger alikariya wî û ya Aleksandr D. Jaba nebûya, dê der heqê wêje û çanda Kurdan a di serdemia navîn de pir tişt nehatiba zanîn"

"Mela Mahmûdê Bazîdî kesekî di sedsala 19mîn de ji pisporiya ol û ziman hatiye nasîn. Di nivîsên xwe yên edebî de hunermendekî mezin e..."

Min wergerandina pêwîstiya vê pirtûkê, ji Rûsî Kurmanciya jêrîn, xasma ji bo ku civata Kurd orf û edetên xwe yên kevn nas bike... Lewre hinek orf û edet li ber jibîrbûnê ne. Mîna ku tê zanîn Xanîma Rûdenko, bi xebatek mezin ev berhem wergerandiye Rûsî û bi wê jî nemia ye, nîşanî gelek pisporêن Kurd daye û bi jêrenotan ve gelek çavkaniyêن girîng nîşan daye." (Dr. Şükriye Resul, Endamê Perwerdehiya Zanîngeha Hevler/1981)

Dîsa Xanîma Rûdenko, di sala 1963'an de li Leningradê (Petersburg) di "Ji bo çapa Rûsî Pêşgotin"ê de dibêje ku;

"...Xusûsiyeta wî ya herî balkêş bi huner û xwediyê hizirîneke gelek firehbûn bû. Jixwe ji ber vê hunera xwe gelek materyal gihandiye me. Mela Mahmûdê Bazîdî, bi Erebî, Farîsî û Tirkî pir baş dizanîbû û nivîskarekî di van zimanان de berhem dabû. Ji kesên herî bi nav û deng ê dewra xwe bû."



Aleksandr D. Jaba Poloni bû. Lê Kosûlê Rûsyayê yê Erziromê bû. Li ser ziman û çanda Kurdî gelek xebitiye. Xebatên wî bi navê “*Receuil de Notices et Extraits Kurdes*” di sala 1860'an de li Petersburgê çap bûye. Jaba, bi Kurdî jî hîn bûye û bi rewşenbirê Kurd Mela Mahmûdê Bazîdî û gelek Kurdên xwedî kesayetî re der heqê Kurd û Kurdayetiye de zanebûma xwe bi pêş de biriye.

Jaba ferhengek Kurdî-Fransizî, ferhengek axaftinê amade kiriye. Xebatên Jaba ji alî Akademiya Zanyariya Rûs û Mûzexaneya Asyayê ve piştgirî hatiye dayîn. Bi xwestin û pêşniyariyên Rojhelatnas Bernhard Dorn (1805-1881) folklorâ Kurdî, Ziman û Wêjeya Kurdî, etnografsa û li ser Dîroka ve Kurd xebat kiriye.

Tevkariya Jaba ya herî mezin ji Kurdolojiyê re bi alikariya Ferdinand Justi ve ferhenga ku bi 15.000 pevv ve “Kurdî-Fransî” amade kiriye, ew e. (*A. Jaba, Recueil et Resits Kourdes, St. Petersburg, 1879*) (PUKMedia).



Bi rastî jî seranserê Kurdistanê di nav hemû Kurdan de Destana Memê Alan hem bi navê xwe yê orjînal hem bi navê ku Ehmedê Xanî lê kiriye Mem û Zîn her û her têne gotin; hem bi awayê kilamê hem bi awayê çîrokê.

Ji ber vê yekê çiqas xebat li ser vê mijarê bêne kirin jî, ne mijar, ne çîrok, ne jî vegotin ji qîmet de nakevin. Ji ber ku mijar, bûyerên di nava mijarê de diqewimin, mîna ku gelek pisporêñ edebiyatê dibêjin, bi dewlemendiya xwe jî destanê yewnanî yan ji Hamleta Shakespeare ne kêmtir e.

Lewre Mela Mehmûdê Bazîdî, ne bi tenê şexsiyeta xwe ya piralî, rewşenbir, têkoşer, mamosta û diplomat, lê bi alyê xwe yê edebî jî gelek xurt e. Bila neyê jibîrkirin ku zimanê Kurdî ne bi tenê di serdemâ bîst-bîst û yekan de di bin zor û zehmetiyê de ye. Di wan demêñ ku nivîskar tê de

jîyaye jî, zehmetî û zorî ji îro ne kêmîtir bûn. Ev rastiyên hanê di nava xetên Ehmedê Xanî de eyan beyan li rastê ye.

Di encamê de Mela Melmûdê Bazîdî, bi rasteqîn jî pêşewayê pexşana zimanê Kurdi ye.



Par van deman bû, kek Lal Laleş cara pêşiyê qala projeya rêzepirtûkan ji min re kiribû. Lê ji ber ku gelek caran, gelek kes, qala gelek projeyan dikin, heyf û mixabin, bi piranî jî ew projeyen ku di nava xwe de balkêş, xweşik û ronak in, herçî ku diçe kevn dibin, ji rojevê dikevin, nîvçê dimînin an yekser têne jibîrkirin.

Lê bi sê hefteyan berê li ser vexwendina kek Lal Laleş û Kawa Nemir dema ku me hcîv û din li buroya Weşanên Lîsê dit, eşkera bû ku proje li ser gotinê nema bû û bi navê "Rêzepirtûkên Ehmedê Xanî" hatîbû ber çapê.

Ez bawer im dê berhemên vê rêzepirtûkê ne bi tenê di pirtûkxaneya kesên pispor de, di pirtûkxane û malên hemî xwendekarên zimanê Kurdi de, heke ne xwendekar be jî, di destê dostên zimanê Kurdi de, cihê xwe yê taybet bigirin.

Ji ber ku ziman; nasname ye, hebûn e, kesayetî ye, pêşeroj û paşeroj e.

Sedat Yurdaş  
30 Avrîl 2007 / Amed

# هەوا لىنامەى كىتىب

# Mele Mehmûdê Bazîdî

هەوا لى نامى كېلى:

Mele Mehmûdê Bazîdî, di sala 1797'an de li bajarê Bazidê ji dayik bûye.

Navê wî, Mehmûd ji aliyê malbata wî ve hat lêkirin. Gava mezin bû û li medreseyan dest bi xwendinê kir û bû mîlayekî qenc, jê re Mele Mehmûd hate gotin. Ji ber ku malbata wî ji bajarê Bazidê ye û ew bixwe jî li wir hatiye dinê, leqeba Bazidî bi navê wî ve girtiye û jê re Mele Mehmûdê Bazidî hatiye gotin.

Mixabin roja koçdawiya vî zatî ji aliyê me ve, bi vebir nayê zanîn. Lê tê zanîn ku heta salên 1860'i jiyaye. Lewre di wê mêtjûyê de jî berhem nivîsîne. Paşî belgeyek bi destê me ket ku tê de koçdawiya Mele Mehmûd 1863 nivîsandibû. Me ew yek li vir qeyd kir.

Mele Mehmûd, li Bazidê zarokatiya xwe derbas dike. Di

nav zarokêñ cîranan de, dilîze; bi wan re radibe û rûdinê. Ev kar heta digihîje dema xwendinê didome. Dû re dest bi xwendina Qurana pîroz dike. Mewlûda Bateyî û Nehcûlenama Mele Xelîlê Sertî dixwîne. Ji bo xwendina Nûbara Ehmedê Xanî û pirtûkêñ din derbasî medreseyâ Bazîdê dibe. Di nav feqîyan de radiweste û bi wan re dixwîne. Pişti demeke ku dersêñ wî bi pêş ve diçin, êdî wekî giraniya feqiyêñ Kurdistanî dikeve rîza medreseyan. Di gelek medreseyen Kurdistanê de dixwîne. Zimanê Erebî, Farisî û Osmanî hîn dibe. Pişti qedandina dersan û standîna îcazê, difitile bajarê Bazîdê. Li wir, ji aliyekevî ve dersa feqiyêñ medreseyê dide û ji aliyekevî ve, li ser wêje û rîzmanê Kurdî dixebite.

Bi giranî xebatêñ xwe bi zaravayê Kurmancî dinivîsîne. Şerefnameya Şerefxanê Bedlisî ji zimanê Farisî werdigerîne zaravayê Kurmancî. Di heman gavê de, helbestan ji zimanê Erebî, Osmanî û Farisî werdigerîne zimanê Kurdî. Dîroka Kurd û Kurdistanê ya pişti Şerefnameyê heta dema jîna xwe, bi rewşike zanistî û têkûz dinîvîse. Li ser wêjeya Kurdî radiweste û beşekê jê dinivîse. Rêzimana Kurdî digel gelek qeydeyêñ rêzimanî hildide destê xwe û dinivîse. Ji bilî van, gelek berhemên din jî ji destê vî zatî derketine. Lê heta niha yek ji van berheman bi destê me neketiye. Piraniya berhemên Mele Mehmûd, di arşîvîn Petersburgê de hatine berhevkirin.

Ji berhemên Mele Mehmûd a ku heta niha me dîtiye û di destê me de heye, bi tenê pirtûka "Adab û Risuma Kurdan" (Erf û Adetên Kurdan) e û bi zaravayê Kurmancî nivîsiye.

Erf û Adetên Kurdan bi rewşike zelal û bi hisdarî raxis-tiye pêş dengê gelemparî. Bi qasî em pê agahdar bûne, ev pirtûk li zimanê Rûsî, Tirkî, Erebî, Farisî û zaravayê Soranî hatiye wergerandin.

Mele Mehmûdê Bazîdî, ji bo ku gelê xwe baş binase, li

erdnîgariya Kurdistanê baş digere. Li nav eşîran, koçeran û gundan gelek dahûrandinan dike, hal û tentêla wan qenc hîn dibe. Mêvanî, malovanî (mêvandarî), keçxwestin, dawet, cîrantî û yên din qenc hîn dibe û van zanînan di serê xwe de, bi cih dike û paşî dixe ser kaxezê, bi van bîzavan pirtûka wî ya bi navê "Adab û Risuma Kurdan" derdikeve holê. Qenc guhê xwe bidine pêşgotina vê pirtûkê ya çapa Rûsî M. B. Rudenko ka çi dibêje:

"Eger xebata Mele Mehîmûdê Bazîdî digel Aleksander D. Jaba nebûya, ev çand û nasîna Kurdan a çaxa navîn bi vê rewşa sererast dê bi dest me neketa."

Melc Mehîmûdê Bazîdî, kesekî berhevkar û arşîvkar bûye. Xebatênu ku dikirin û ew belgeyên ku bi destêni wî diketin, gişk arşîv dikirin û arşîva wî ji her kesî re vekirî û serbest bû. Gelek kesan û zanayan jî pirtûkxaneya Mele Mehîmûdê Bazîdî havil didît û xebatênu ji wan re pêwîst li wir pêk dianîn.

Konsolosê Rûs Aleksander D. Jaba, di nîveka sedsala !Qan de, ji bo konsolostiya Rûsan tê bajarê Erziromê. Jaba di demêñ borî de kêfa xwe ji çand, dîrok û wêjeya Kurdi re anîbû. Li Erziromê ev keys xweştir kete destan û bi Mele Mehîmûdê Bazîdî re peywendî danî. Hêdî hêdî hevdu nasîn. Ji wê rojê paş êdî gelek xebatênu wan bi hevdu re di-xuyin. Xebatênu wêje, dîrok, çand û rîziman bi hevdu re pêk tînin. Mele Mehîmûd, jî pirtûkxaneya xwe gelek pirtûkan dibexişne Jaba. Di nav wan de, gelek jî destxetîn. Heinîn e ku ji wan destxetênu Mele Mehîmûd yek jê pirtûka "Adab û Risuma Kurdan" bû. Bi vî awayî destxetênu Mele Mehîmûd ketine destê Aleksander D. Jaba. Dema derbasî welatê xwe dibe, destxeian jî bi xwe re dibe, li arşîva Petersburgê dînivîse û radestî refa wê dike. Ji wê rojê paş ve bi gîcanî ji hemanî arşîvê havil tê ditin.

Li vir, em çend paragrafan ji pirtûka wî zatî ya bi navê "Adab û Risuma Kurdan" pêşkêşî xwendekaran bikin:

“Kumreşî û bedgumanî li nik taîfêن Kurdan tune ne. Mesela, jinêن wan ên ciwan, digel mérêن biyanî xeber didin, dikenin, rûdinin û radibin. Ew bedgumaniyê nakin. Îla ku xirabiyê bibînin û yeqîn bikin helbete bêmecal wê jinê dikujin û wî mérî jî. Êdî yê wan xwîn tune. Kesek li wan nabe xweyî. Kurd li hemû qebahetan dibine xweyî, lê li şola xirab nabine xweyî. Lewre li nik wan gewî eyb e.

Yek ji adetê Kurdan e ku xwîndar şûrê xwe davêje stuyê xwe û topek cew dide binçengê xwe û diçit xwe davêje mala xweyê xwînê ku; ‘Eva şûr û eva kefen, an min bikuje yan min aza bike!’. Îcar xweyê xwînê helbete wî xwîndarî aza dike.

Eger Kurd, îhsanek, keremek û qenciyek ji yekî bibînin, qet ji bîr nakin. Daîm wê qenciyê, di nava xelkê de, di meclisan de dibêjin û xirabî jî wisa. Ji ber awaza qenciyê daîma merama wan ew e ku xizmetekê bikin. Ji ber xirabiyê jî mibadela wî bi xirabî û heysê bikin. Ew dibêjin ku qencî jî, xirabî jî winda nabin. Xeberdan bi cewabê perwa dibin. Hakim bit jî, helbete cewaba heq dibêjin û natirsin. Bila wî te’zîr jî bikin. Elbete wê cewabê dê bibêjin. Di xeberdanê de xwedî cesaret in. Eger bêne kuştin jî, dîsa xem nîn e. Yanê bi rastî wekî miletên mayî ji kuştine natirsin û dilêr in.

Ekserê Kurdan jinek tenê tînin. Nadir axayêd wan bi du sê jinan re dizewicin. Jinberdan di nav wan de qewî kirêt û eyb e. Ev yek kêm diqewime. Zehfê jinêd wan hise û pere ji malêd bav û dêyêن xwe nastînin û dibexşînîn warisê mîr.”

Feqî Huseyîn Sağnîç

#### Çavkanî:

- Büyük Ansiklopedi, Milliyet Yayınları, Cild 10, 1990.
- Ruhanî, Babe Merdox; Târixê Meşahîrê Kurd, Tehran 1952, Cild 2, r.1 1947.
- Bazîdi, Mele Mehmed; Adab û Risumên Kurdan.

# Mem û Zîn



هەوا لىنامەى كىتىب

# هەوا لىنامەى كىتىب

Ji şairê Kurmancan, bi zimanê Kurmancî, di tarîxa  
hezar û şeşsedî de, di qeseba Bayezîdê de, hezretî Ehmedê  
Xanî kitêba ku telîf kiriye bi wezn bi navê Mem û Zinê, aşiq  
û maşûq, li wechê muxtesr beyana wan dike.

Di zemanê pêşîn, di wextê taîfa el Milûkan de, di tarîha  
şes sed û salekî hîcî de, ji taîfa Kurmancêd Ereban, ji sil-  
sîla Hezretî Xalid, bixoser, ne di bin hukmê kesevê de,  
hisêbke gora zenianê xwe, di Cizîr û etrafê wê de, herçî  
taîfeyê Kurmancan ku hebû di nav wan de wekî qiralekî  
bixoser; mîr Zeyneddin nav mîrekî bi nav û şan û mirxes el

enan, xoyê mexsed û meram hebû. Ji bo mîrê melûm jî, hemû esbabê xundkarî û miradxwazî jî di dereca kemalê de bû û mîrê melûm jî di husn û rindî de nadire el zeman.

Du xuh ji wî re navê ya mezin Sitî û navê ya biçûk jî ji nîvê navê wî bû ku Zîn dibe. Ev her du keçêd pak, spî, gihane dereca kemalê. Di nav heremserayê de, xudam û cewarî di xizmeta wan de, bi naz û nîmet perwerde, bi keyf û sefayê, di eyiş û zewqê de bûn. Ji her kenaran xwazgîn û talibên wan hebûn, lakîn lewra ku hinkuf nebûn, nedan.

Dîsan ji nav Cizîrê, ji eşrafên begzadan û eyanan, Eskender nav pehlewanekî zemaneyî hebû. Sê kurêd wî jî hebûn, qewî behadir û xweyî quwet. Navê yê mezin Tacdîn û navê yê nîvkê Çeko û navê yê biçûk Arif bû. Ev her sê jî, di xizmeta mîr de bûn. Emma Tacdîn, qewî muqerebê mîr bû zehf jî li nik mîr qewî zêde mera el xatir bû.

Di wî wext û zemanî de sersal dikirin. Wê rojê, ehalî û xelkê bajêr, hemû feqîr û dewlemend, mezin û biçûk, nêr û mê, imûmî ji bo geşt û geryanê, bi derve diçûne deşt û sehrayê. Cins cins û ref ref, derve resma keyfxweşiyê îda Newrozê li wê derê icra dikirin, lewra wî zemanî qismê taîfa jinêd musilmanan hemû mestûre û veşartî bûn; bi ruyê namehrem û biyaniyan nediketin. Lakîn roja ku ew îda Newrozê dibû, hîcab û perde ji taîfa jinan radibû; mîr û jin wê rojê bi hev xuya dibûn. Eger kesekî qîzeke bakîre

hebûya, wê wextê kurê ezeb didîtin. Her kesê ku meyl û mihebeta kê dikira, eger hingov bûya paşî bi emrê şerîetê ji bo xwe dixwastin. Ji bo vê xeberê, wê rojê, pîr û ciwan, imûmî bi derve çûbûn û li geşt û seyranê bûn.

Dîsan ji ehlê Cizîrê, lakin ji dereca nîvekê, digel Tacdîn li hemumîr, navê Memi ciwanek hebû. Dibîrzade bû ew jî. Digel Tacdîn ji qedîm de eqid û benda kemera birayetî girêdabû û elaqâ mihebet û modeta sadîqe girêdabû. Her daîm digel yekûdu diketin û radibûn. Wê rojê mîr Zeyneddin jî, ji bo hemû xulam di xwe re destûra çûna geşt û seyranê da. Tacdîn jî hat digel birayê xwe yê sadîq, Mem.

Her du ketine libasa du jinan, tebdîl el qiyafe di sûretê jinan de, çûne nav cemiyeta mezkûr. Li vira li wî digerîyan. Li wî kenarî em bêne halê Sitî û Zînê. Ewan jî fikir kirin. Ew her du jî ketine libasê mîran, tebdîl el came. Ew jî çûne nav cemaetê. Di wî zemanî ku kaşû listin adet bû. Sitî û Zîn li sûretê lawan, digel kurêd ciwan ku kaşû dilîstin, di wextê ewan ew riwal dilbendî de aciz kiribûn, Tacdîn û Memo jî wê wextê rastgele di libasê jinan de hatine wê derê û ew hal û cerebalixa xelkê dîtin.

# هەوا لىنامەى كىتىب

Ev ehwala ji mirovekî pîr pirsiyar kirin. Ew jî cab da ku du lawêd ciwan peyda bûne û herçî ciwan ku dilîza de ye bi zora milêd xwe li benda ku kaşuyî ji wan standibin. Lakîn qet kesî ew nenasîn. Ji vî bajarı ne, emma kî ne? Nehate zanîn. Ev xebera Tacdîn û Memê ku di sûreta jinan de bûn kubihîstin, çûne nav wê qerebalixê. Ji kenarekê ku Sîtî û Zîn ku di şeklê kuran de bûn, fi el hay yanî nafilî ji kenarê Xudê de Tacdîn li Sîtî û Mem li Zînê mubtela û aşiq bûn. Elaqa vînê li wan her dukan girêdan û ji kenarê Sîtî û Zînê jî, dîsan wiha elaqa mihebetê di kemala dereceyê de peyda

bû, ji her du terefan de, bîla nihaye, bi yekûdu re pabendî vînê bûn û Tacdîn û Mem ji kemalê dereca mowedetê xwe şimirandin û hisêbke bêhiş bûn. Lakîn Sitî û Zînê, çunku ixtiyara wan ji dest neçûbû, nêzîkî wan bûn. Sitî muhra xwe ya cewahir deranî, kire tiliya Tacdîn û muhra wî jî deranî kire tiliya xwe. Û Zînê jî, dîsan wiha, muhra xwe deranî kire tiliya Memê û muhra Memo jî deranî kire tiliya xwe. Paşî bi teref heremsera xwe ve çûn.

Paşî wan Tacdîn û Mem jî, ji meya hîretê hişyar bûn. Tacdîn di tiliya xwe muhrekî cewahirî dît ku li ser wî navê Sitî hatiye kolan û neqîş bûye. Mem jî wiha muhrekî cewahirî dît ku navê Zînê hatiye nivîsîn. Ev her du wiha giriftarî belayê evînê bûn. Di vî halî de, mat û mutcheyir-bûyî man. Ji kenarê din em bêne elhwalê Sitî û Zînê. Ew her du jî vegeriyan û hatine heremsera xwe ya xas. Îdî gav bi gav ketine agirê eşiq û muhebetê, roj bi rojê coş û xiros dikirin. Ew her du jî zar û zeif bûyî, şev û rojan hawar û gazî dikirin û halêd wan perişan bû.

Dayînekî wan î pîr, ecûze, salxurî û dinyadîtî û di imûrê dinyayê zehif îdrak û pir sinûn bi navê Mîzebûn hebû. Ew dayin ku halêd wan wiha perişan dît, kete şibhê û sebebê perişanî û melala elhwalê di wan pirsiyar kir. Ji ibtîda ewan rîya îñkarê girt. Paşê dayîn ji bo wan weid û weîd kir, qata ev derd û ev hala, li serêsalê li we peyda bûye, her çawan e

eger ji şerê ins û cin û periyän jî bibe, elbet e tedbîrek û îlacekê kirin ji dest min tê, vî derdî ji min xef cayiz nîne. Paşî çiqas diçe baîsê helaka we dibe?

Wekî wiha gote wa, Sîti û Zînê macera wekî bûyi, kemakan teqrîr û beyan kir. Dayîn cewab da ku erê xebera we qewî qenc di rêya Xuda ye, lakin ev e ku dibêjin me keç diye û hebandiye. Keç keçan bihebînin û aşiq bibin bêfayde ye û semre nade, belku keç li kuran û kur li keçan aşiq dîbin û ji hevdu behremend dîbin. Ji du keçan ci hasil dibe eger fi el waqîî êd we dîtî eger kur dîbin. Ez di ilûman de mahir im, li esimana melayîk, li erdî perî jî bibin, ez dê bi quweta îlmê nicûmê û remlê bibînim û mesxerî we bikim.

Paşî, Sîti û Zînê ev bihîstin, ew muhrêd ku berê ji Tacdîn û Memo estandin û anîbûn bi deranîn û dane destê dayînê. Eve nişanêd wan keçan eger bi rastî tu îlmê remlê dizanî, xuyêñ di wan bibîne kî ne, gotin. Dayîn jî muhr stand. Di wî zemanî de di nav Cizîrê de melayekî qewî remal hebû. Çû nik melayê remal û got ku du kurêd min i sêwî hene. Roja serêsalê çûne geryanê, paşî ku vege riyan, nexweş û bedhal in, lakin di destê wan de her yekî hengostîrek heye. Ev e ci hal e û ci bela ye; ez nîzânim. Melayê remal gava ku fikirî li şîklê remlê, navê Sîtiyê digel Tacdîn û navê Zînê digel Memo dît. Wekî ehwal ji remlê zanî, gote dayînê:

–Ji bo ci diro dibêjî? Bi derewan şuxîl nayête dîtin.

Paşî, ew made wekî bûyî ji ewel heta axirî ji bo dayînê neqil kir û beyan kir û got ku xweyêd muhran, yek begzade ye û navê wî Tacdîn e û yek jî dibîrzade ye û navê wî Mem e. Welakîn ew her du jî bi vî derd û elema eşq û vînê mubtela û nexweş bûne. Rabin hûn xwe bixine şiklê hekîmekê û herin ewan bibînin. Wê wextê, ehwalî dizanin. Li ser vê xeberê, tebdîl el lîbas bû, xwe xiste lîbasê hekîman, çû cihê ku Tacdîn û Mem li wê bûn. Wekî dayîn di sûreta hekîman de dîtin:

—Tu hekîm î, were zû nexweşêd me hene, binêre û derman bike!

Heke dayîn birine nik Tacdîn û û Memo, her çi ye nihêrî û nêza wan hisêbke got paşî xelkê ku li wê hazir bûn bi derve deranî ku ez ê derman bikim. Paşî, wekî ewan bi tenê man, ehwal wekî bûyî gote wan û muhrê di wan deranî, da dest wan û digel gotina ehwalî ji Sitî û Zînê silav anî, êmnayî û teselî da dilên wan ku Xudê mezin însaeallah xeman mekin di nêzîk de li ser xeberê qata sûretekî dibîne. Wiha got û Tacdîn û Memo ehwal wekî bûyî ji wan re jî beyan kir, silava wan jî gihande van û êmnahî û dilxweşî jî dan wan, tesela kir ku hal û ehwalê melûmî her du kenaran bi wî agirê eşqê roj bi roj ala û digirt.

Tacdîn ku begzade û xanedan bû, paşî mudeyekî, mela .  
û eiyanê Cizîrê berhev bûn û çûne nik mîr Zeyneddin. Rica  
û hêvî bi emrê Xudê, dana Sitî ji bo Tacdîn û çiraxkirina  
wê derxwast kirin. Û mîr jî rica wan qebûl kirî, Sitî da  
Tacdîn. Gora wî wext û zemanî tedarek û pêkhatineki  
dirust hazir kirin di nav hindek wextekî de daweteke xund-  
karane kirî. Sitî bi rê kirin û eqda nîkaha wê li Tacdîn kirin.  
Ew her du aşiq û maşûq digel yekûdu gihane mirad û  
mexsedê, lakin Mêm û Zîn dîsan wiha di agirê eşqê de  
dişewitîn, li ser halêd xwe, bi ax û dax mayîn.

Paşî mîr Zeyneddîn dergevanekî heremê hebû, qewî heramza û muftîn û tilbîs, navê wî Bekir bû. Ew heramza mexsûs ji hesed û dexes û nîfaqê di vê şûlê de direft. Çav re dikir, rojekê ewî mîr xelwe dît û hisê ku ji bo xêrxwaziyê çend xeberên di min hene ifade bikim, got:

—Ey birê, ku dana Sitî be Tacdîn şûlekê ne layiq bû, lakîn her çi ye, te ew da; çû begzade ye. Lakîn Mem kurê debîran e û çavê wî jî li Zînê ye û Tacdîn hisêbke bi xweser, Zîn daye Memo. Wiha digel wî qewil kiriye. Ev çi xeber e? Ev e dewrê xîret û mezinayiyê ye; ev çi ye? Bivê hûn çewan rahetê dibin?

Mîr berê bawer nekir ku eslê vê xeberê dê nebe. “Ez zêde Tacdîn û Memoyî hez dikim. Ew jî şûlêd wiha nelayiq nakin û kirina wan qet tesewir nakim.” Eger çi got jî, lakîn Bekirê minafîq bi her terzî dest bi iftira û bohtanan kir. Li ser vê jî mudetek zeman borî.

Mem cuda û Zîn cuda, her yek bi derdê eşqê dişewitîn. Wiha pêlekê çû. Baxçeyekî mîr Zeyneddîn, qewî dilguşa û cihekî keyf û sefayê hebû ku di nav wê de otax û dîwanxane û qulatîn û bixeýr ji wan her çi lazimî di ibra xundkarane hemû mewcûd bû û mureteb û muzeyen amade. Her lewazimatê ku diva, dayima hebû. Carinan digel nedîm û muqereb û eyanan diçûme wî cihê keyfê, li wê derê eyş û uşret dikirin.

Rojekê mîr digel nedîni û etbaên xwe çûne nêçîrê; ew baxçe wiha musmir, vala mabû. Dilê Zînê teng bû, ji bo teferucê bi tenê hate wî baxî û digeriya. Meger ji kenarê dinê Mem jî ku bi tenê mabû, dilê wî jî teng bûyî, ew jî bi tenê rast kullen hate wî baxî. Mem û Zîn di nav rezî de liqayî hev bûn. Her ci du aşiq û meşûq hevdu dîtin, car girîn û car ken, bi keyfxweşî enan, ixtiyar ji dest çû, her du aşiq û meşûq bi jor ve derketine dîwanxaneyê û hevdu hembêz kirî digel yekûdu, aşiq û meşûqane, dest bi xeber-danê kirin. Yek car wexti û çax û hatina mîri ji bîr kirin. Bi

vî halî, ji meya vînê serxweşbûyî di keyf û sefayê de bûn heta êvar jî nêzîk bûyî.

Qezay nagîhanî, mîr Zeyneddin nêzîkî êvarê ji nêçîrê zîvirî, wiha rast hate baxî. Li ber derê wê qesra melûm ji hespî peyabû. Li vir şerbet û qaweyekê bixwin û hêsayî bibin, gotî. Digel xulam û oldaşêd xwe wiha ji nişkê ve hatine dera qesrê ku Mem û Zîn tê de bûn. Zîn wî wextî ku dengê birayê xwe bihîst, hiş hate serî û got: “Memo ku çe dibêjî û çe dikey? Ev e mîr hat!”

Ku ev xebera got, êdî naçarî, Memê Zîn stande binê ebayê xwe û veşart û li goşeyeke qesrê qelbexî û rûnişt, di nav du balgiyan de, wiha bi wî halî. Mîr digel qelebalixa xwe hate hundirê qesrê û dît ku Mem xwe li ebayî pêçaye û li goşeyekê rûniştiye. Mîr silav da jî, Mem silav stand, emma qet ji cihê xwe nebizaft.

“Mîr im mezûr bidêrin ev benî nexoş im, hatime vira û min ta girt, qet mecalâ libat û hereketê nadêrim, li vira wiha mam.”

Mîr got: “Zerer nîne ku li keyfa xwe binêrin.” Mîr rûnişt û her kesek câbicê rûniştin. Dîwanxane tijî bû. Mîr şerbet û qehwe emir kir. “Îşev li vira keysekê bikin.” gotî.

Ji her terefekê dest bi kilam û xeberdanê kirin. Meclis kemilî û germ bû. Tacdîn di wê meclisê de hazır bû, li halê Memo nihêrî, zanî ku ji ehwalekê ecîb e. Xalî nîne ku Mem

wiha nuqmî behra xemian bûye. Tacdîn rabû hate nêzîkî Memo û bê işaret ehwalê wî jî pîrsiyar kir. Mem jî du kezî jî porêd Zînê ji huçka ebayî bi xev deranî û nîşanî Tacdîn da. Wekî Tacdîn ev dît, made çi ye fehim kir, kete behra fikir û hîretê. Çare û tedbîra vê çi ye? Eger tedbîrek nebî ev meclis dirêj dibe û ev şûla paşî aşkera dibe. Mêm û Zîn riswa bûyî, telef el ness dibin û bixeyrî ji wê zehif fitne û fesad jî bi vê sebebê peyda dibe. Derhal ji meclisê bi derve derket û çû giha mala xwe û gote Sitî:

—Zû zaroyê xwe digel matkê hilîn û bi derkev!

Her çiqas ku Sitî pîrsiyar kir ku çi ehwal heye? Got ku niha wextê xeberdanê nîne û agir hilanî û ji çarkenarê xaniyê xwe agir û şewatê da, bi xwe jî ji derve dest bi hawar û gaziyê kir. Xelkê ku gazî û hawarbihîstin, ehwal gotine mîr. Wekî ev hala melûmî mîr û xelkê ku di qesrê de li wê meclisê de bû, her kesek bezîne di defa agir û şewatê û di qesrê de bixeyrî Mem û Zînê kesek nema mabin. Wekî xalî bû, Memo gote Zînê ku:

—Te dî Tacdîn çewan wekî hezretî Xidir geha îmîdada me û bi çi terzî ev belaya asmanî ji serê me defii kir?

Zîn rabû çû sera heremxaneyê, Mem jî rabû hate defa şewatê. Xulase heta hatin mecmûê mal û emlakê Tacdîn de rîya birayî de sot. Yarê wî bi vê wasîtcyê ji belayê reha bû.

Xweyî kitêbê dibêje ku yar eger dibe, dê wiha be. Paşî

dîsan Bekirê mufsid û xereza winda bûyî çawane ev macera his kiriye û ev ewhala bi xef gote mîr û mîr jî zehif xezebnak kir. Mîr jî bi ci terzî em waqîfî heqîqeta vê şûlê bibin.

Dîsan ev mufsid û melûn got ku:

—Mîr im, rojekê bi xef, meclisekî biçûk, Memo bi tenê, bê Tacdîn û Çeko û Arif bixwaze bilanê bêtin, ilhah li Memo bike ku tu kê dihebînî? Bêje min ez ji bo te dê bixwazim. Ez milaheze dikim ku Memo mirovekî bêperwa ye, hebandina Zînê dibêje we. Wî wextî êdî şubhe namîne; ceza wî tertîb dikey. Bena li ser vê xeberê ku li hizûra we ez xuha te dihebînim dibêje, mocibî siyasetê dibe.

Li ser vê xeberê, mîr bi xef, Memo gazî kir û rûnişt. Got:

—Were digel te şetrenc bileyizim. Eger ez distînim û ji te dibem, li ser vê qewlê merama min ew e ku her kîjan keçê dilxwaza we ye, tu bibêjî! Ez ji bo te dê bistînim û bidime te.

Li ser vê şertê, her du leyiztin. Mîr sê dest temamî ji Menro birin. Êdî angora şertê xwe dest bi pirskirinê kirin.

Meger li wê mabeynê Tacdîn ji vê behsê xeberdar bûyî. Bixwe digel her du birayêd xwe, Çeko û Arif, çek û sîlah rabestî, li wê navê hatine meclisa mîr. Êdî mîr jî qewî li Memo ilhah dikir ku bibêje. Bekirê mufsid fikrî Mem îxmaz dike û nabêje. Ewî mufsidî, bi tîin û nic gote mîr ku: “Mîr im ez dizanim ya Memo hebandî, qîzeke ereban e lêv

deqandî."

Wekî mufsidî wiha got, êdî Mem ji ïnadê tehemul nekir. Bê ixtiyar, cuzek ji ewsafêd Zînê destpê kir, got: "Mîr im ku ez dihebînim necîb û xilan begzade ye. Nîhayet el emir, çiqas ku Memi zêde erinî navê wê jî Zîne xuha we ye."

Êdî mîr jî hate xezebê û got ku: "Ey nimekheram tu kî yi ku xuha min aşiq bibî û navê wê jî li hizûra min aşkera bibêjî?" gote qebîla xulaman:

-Evî bigrin û bend û zîndan bikin, emir kir.

Tacdîn digel her du birayan, pir silah rabûne li ser piyan û li Memo derketün û gotine wan ku li vê derê heta em nemirin, kesek ji we nêzîkî Memo nabe.

Mîr fikirî kê dê fitne û sesad rabe, bi xwe destmala xwe avête stuyê Memo û şande zîndanê û Tacdîn digel birayan, êdî ji xatirê mîr neborîn, rabûn meyûs û erinî ji wê derê hatine malêd xwe. Mem jî mudetekê zav di zîndanê de mayî.

Zîn jî, ji vê keyfiyet û eliwalê, bêhisêb û melûl û mehzûn bûyî, şev û rojan sola wê hawar û gazî bû û Mem jî, bi hestreta ruyê Zînê di zîndanê de giryan û nalan ma û Tacdîn digel du birayan û etbaan ji mîr rûgerdan û sil di malêd xwe de sekinîn.

Li ser vê halê mîqdarê şes mehan Mem di zîndanê de mayî. Ji arezûyê ruyê yarê û zehmeta bend û zîndanê, roj

bi roj zeîf û jar û perişanhal bûyî qewî kesb halekî xirab kiribû.

Li ser vê xeberê, Bekirê mufsîd ji vê ehwalê û perişaniya Memo xeberdar bû, fikir dikir ku “Êdî Mem ji vî derdî xelas bûyîn mehal e. Lewra mîhneta eşqê û zuifa halî li wî tesîr kiriye kullen bêderman bûye, eve di nêzîk de fewt dibe zerer û xirabiya wî qata digehîte min.”

Lewra Tacdîn qewî pehlewanekî nanidar bû û ev Bekirê mufsîd jî qewî zêde tirsa. Hîlakî dikir, êdî ji bo xwe fikra xelasî û necatê kirî. Di wextekî tenha dîsan torê hîlan tijî kir. Çû nik mîr Zeyneddin, paş erzê xilûs û îbraza sedaquetê, dest bi xeberdanê kirî, got:

—Mîr im, îrohe xase ez çûme zîndanê û min Mem dî û qewî qenc li ziufê halê wî û mereza wî ku di dilê şuxelte, min fehim kir û min nêrî nebza wî digirt elametê jînê kullen jê çûye, belku di dereca miriyan de ye. Yanî min bi yeqîn ger ku eger fî el waqîî Hezretî Mesîh û Hezretî

Luqman jî bêne ser wî, çareyek li jîna wî nabî, bê şebih mirina wî muquerer e. Wekî Mem bi vî halî di zîndanê de telef bibe, meilûmî dewleta we ye ku ji kenarê Tacdîn û biran û teeluq û erbaêd wan di vî bajêrî de, çi derece fitne û fesad dê peyda bibî û belku dê di Cizîrê û milkê Bohtan û mabeyna eşâîr û qebayilêd wan de li van etraf û kenaran heta roja heşrê birûdet û dijminî dê waqii bibe. Xulase bixêr ji sebeba belayekî ezîm e, bila şebeh dê bîte baîsê hilaka me jî. Wiha bûyîn emrekî aşkera ye.

Ev qiseya wekî hatî zikirkirin ber wechê beyan îfada mîr kirî û bi mîr jî da fehmandin. Mîr jî ku bihîst, bi rastî derka vê şûlê kir, qewî zêde kete fîkr û xemê û got ku tedbîra vê çi ye? Ji Bekirê mufsîd pirsiyar kir. Mufsîdê melûn got:

—Bi tenê çareyekê vê şûlê heye ku selamet û xilasiya mîr û min û welatî bi wê dibe! Min fikir kiriye hûn wisanî bikin ji wê jî kesrê namûs û îtibara we nabîtin!

Mîr got ku bibêje bibînim! Dest bi xeberdanê kir:

—Mîr im, tu eseh bizane ku Mem dimire, belku di dereca miriyan de ye. Niha virêken Tacdîn digel biran gazî hizûra xwe biken û dilê wan vegire bi her yekî xelatekî bide û bêje ku ez lume û Memo peşîman bûm û guneha min bi Memo hat. Lakîn çi çare muqeder wiha bûye. Min di bedela vê zulmê de Zîn da Memo. Hûn herin bi keyfa xwe bin! Ez virê dikem Memo ji zîndanê biderînim û tînime

hizûra xwe, xelat û kereman dikem, Zînê jî didem û çirax dikem. Paşî herin di heremiserayê de Zînê jî gazî hizûra xwe bike û dilê wê jî vegire û emrê bike ku çend cewariyan digel xwe bibe û here zîndanê biderîne. Ez dê bi emrê Xudê te biceme Memo! Wiha bike, Mem xwe dimire û namîne. Em jî ji belayê xelas dibin û mîr im namûsa we jî naşkê. Îtibara miriya we jî li cihê xwe dimîne.

Mîr jî ku ev xebera ji Bekirê müssîd bihîst, qewî begen kirî, maqûl dît.

Wekî zikir bûyî, şand Tacdîn digel birayan gazî dilnimayî da û metyeb el xatir xelat da û weid û weid kirin. Dîsan wekî zikir bûyî çû heremiserayê xuha xwe Zîn gazî kire nik xwe, wekî hate gotin, ew jî dilxweş kirî. Got ku herin bi xwe Memo ji bend û zîndanê biderînin û bînin, ez jî dê li ser tedarekê bim di nêzîk de daweta we bi keyf û sefa bikem. Hûn jî di eyş û eşretî de bibin.

Ev xeber û ev şûla di nav Cizîrê de wekî mîzgînî belav bû û her kes keyfxweş û şad bûn ku hezreta mîr li Memo hate rehmê û ji zîndanê bideranî û xuha xwe Zînê, digel mal û xelatan dê bidetin û çirax biketin.

Bîna li ser vê xeberê, Zîn jî, ji vê xisûsê keyfxweş û şadbûyî, xeml û zînet da xwe, ji serî heta pêyan di zêr û zîvî de xeriqbûyî, zîb û zînet da xwediyyêni li ber û herem gihaye pêş û xedam û cewarî li etrefan bi qerebalixekî temam berê

xwe dan zîndanê û daxilî hepisxaneyê bûn. Cewaba hatina Zînê mizgîn birin ji bo Memo. Lakîn çi fayîde? Paşî çi? Beide xerab el Besra. Her çi ye, Zîn hat û Mem dî hem-bêzkirî. Wekî dest bi xeberdanê kirin, Memê jar derhal ruh teslîm kir, ji darê dinyayê axîretê îrtîhal kir.

Wekî ev hala ehlê zîndanê û Zîn û hazirê wê derê ku dîtin bi vê terzê jar û sefil, Memo di zîndanê de bi vê halê zulmen telef û hilak el nefş bûyn; li her kesekî dijwar hat û pê şewitîn û hawar û gazî û girîn û zarî bû ku hisêbke wekî roja qiyametê peyda bû û ji vê şor û şimâteyê di nav bajêrî de û lule û xewxa zahir bûyî. Tacdîn û birayan û eşâîr û qebayilêd dinê û imûmî xelkê hatin şîn û matemekî mezîn peyda bû.

Mîr ji vê waqieyê xeberdar bû, ew jî hate şînê. Herçî uzir û behane dikirin. Ema paş çi? Mem êdî li ser adetê bi defna neişa wî meşxûl bûn. Di wê navê de qezaên Bekirê mufsîd rastî Tacdîn hat, heman fî el hal xencer kêşa, hema li wê derê, ew Bekirê xebîs û mîrdar cezayê wî layîq tertîb kir, qetil kir û leşê wî yê mirar avêtine kenarê kulîvekî.

Neişê Memo, Tacdîn digel birayan li ser serê xwe danîn û mîr Zeyneddin û Zîn û başqe imûmî ulema û suleha û eîyanê wîlayet û ehlê bajêr hemû bê şînekî ezîme û bi qere-balîxekî zav berîn çal kirin. Paşî ku Zîn bi şûn ve hate heremserayê, ew jî bêkeyfbûyî û birayî xwe mîr Zeyneddin gazî nik xwe kir. Ji wî rica û hêvî kir ku: “Evê xedameka xwe efû bikin! Ez jî dê bi xaniyê axretê koç bikim û hendek wesyetêd min hene dê li hizûra we ya alî eriz bikim û li ser dad û edil û însafê adeta ewan hêviyan dê bikim. Ji lewa-zimatê hiqûqê di birayetyê kû ewan der heq vê zeifeyê icra

bikî. Niha ku Mem fewt bû û xedameka we jî li ser çûnê ye, êdî rêza hîcab û veşartinê bûrî, meilûmî cenaba we ya alî bibe ku em her du fî el heqîqe aşiqêd sadiqîn û di nav dinê jî, em negihane yekûdu. Xirabî jî, ji me sadir nebûn. Her çi ye, qeza û qeder û qismeta hezretî layezalî der heqa me de wiha bûye. Çi çak, lakîn jî kenarê cenabê we der heqî Memo de zulm û xedir kullî bû, bîla heq hinde qeder wext di zîndanê de hepis bû û axir el emir jî di zîndanê de merhûm bû. Xedameka we jî bi kenarê axîretê koç bikitin. Ez û Sitî her du xuh in. Wextê ku te Sitî da Tacdîn, te hinde resma dawetê îcra kir û hinde qeder mal û pirtal, techîz daye Sitiyê û paşî ew qeder resm û risûmat û keyf û şayiya xundkarane balacera mezin kirî. Ew qas ayîn û qewâid destûr û sirûrî mureteb mirî. Te ew bi mexseda xwe şad kirin. Ev xedameka we jî li ser isûla edil û însafê û heqanetê ew qeder hise û pare û nesîb, hêvî iltîmas û istirham dikem barî di dinê de ji bo vê zeîfeyê meyser nebû di axretê de jî bêpar bûyîn. Mixalifê mirweta we ya alî bûyin. Şoleke aşkera ye. Bena li ser vê xeberê, sê hêvî di vê acizê de heye; qebûl biken; ewelî ew e ku emir biken roja merga min, wekî daweta Sitiyê, imûmî hemû sûq û bazar û kolanêd bajêrî bixemilînin û tertîb biken; herçî ku alatêkeyf û şayiyê hisêb ke ku goya dewet e îcra biken û di nav sera alî de jî destexivanêd zad û teaman hazır biken;

xebera xedameka we bûyi. Disan wiha, heta sê rojan hemû ehlê bajêr, maldar û feqîr, bêñ gazîkirin, bêñ team û zad bixwin û biçin. Wiha serf û bezîl bibe. Bixêr ji vê jî, herçî ku hezreta we heta salekê temamî di sera alî de û yan bixêr ji vî di cihê dinê de xerc û mesref diken, sewaba wan jî bibexşîne ruhê vê xedameka xwe, evana jî bi niyeta vî acizî serf û bêne dayîn. Wesyeta duyê, emir bikin hemû ehlê bajêr, mezin û biçûk, mîr û jîn, ketek bi şûn ve nemayî, bîlcumle digel neişê min bi tebayî bêñ û bibene meqberan. Wesyeta sêyê. Ew e ku mezrê min jî li tenişt mezr û qebrê Memoyî, mezlûmên bêşûc fewî bûyi, bête kolan û bête hazirkirin. Wextê ku evê zeifeyê piya de dikine nav qebrê, wê gavê jî hezreta we bi dengekî bilind ku ew xelkê hazir-bûyi hemû bêñ bibêje ku min bi husn û reza xwe Zîn da. Memo. Wehan sedayekî paşî evê zeifeyê daynîne nav qebrê û bispêrîne Xudê. Wesyetêd min ev bûn."

Û rojekê paşî, Zîn jî koç kirî, çû dar el beqayê. Wekî hate gotin, matema wê hate girtin. Ew jî tekfin û techîz kirin, wekî ku hêvî û niyaz kiribû, bi wê terzê birin û digel Memo çal kirin. Ev dastana ji wan di dinê de yadîgar ma û hekayeta wan di nav imûmê Kurdistanê de meşhûr e goya wiha dibêjin ku li ser qebra her yekî ji wan darekî gulî heşin bûye û bi jor ve ser kêşaye û li hevdu peçkîne. Niha jî elan qebirê di wan kivşe û li wan etrafan bûye ziyaretgah.

Her kes carinan diçîte ziyareta wan.

Ev e li ser wechê kurtî û ixtisarê, zibda kitêba Mem û Zînê. Ev qeder li vira hate gotin, ji vê zêde heqîqeta halî êdî qenc cenaba hezreta Xudê teala dizane, lewra ev hekaye nêzîkî heşt sed salî heye ku waqii bûye. Êdî, rastî cenaba Xudê teala bi xwe dizane, alim el sir we el xefaya her ew e. Temme.

## PIRTÜKKANEYA EHMEDÊ XANÎ

Mem û Zîn • Mele Mahmûdê Bazîdî

Memê Alan • Evdirehîm Rehmî Hekarî

Gazinda Xencera Min • Celadet Alî Bedir-Xan

Klêopatre • Celadet Alî Bedir-Xan

Hevind • Celadet Alî Bedir-Xan

Eyloyê Pîr • Kamiran Alî Bedir-Xan

Dimdim • Ereb Şemo

Hopo • Ereb Şemo

Reşoyê Darê • Cegerxwîn

Cîm û Gulperî • Cegerxwîn

Li Goristaneke Amedê • Osman Sebrî

Guneh • Qedrî Can

Jana Gel • İbrahîm Ehmed

Gulê • Nûredîn Zaza

Pêşmerge • Rehîm Qazî

Hêlin • Mahmut Baksi

Gundikê Dono • Mahmut Baksi

Govenda Li Ber Mirinê • Bavê Nazê

Gulistan û Şev • Hesen Silêvanî

Weşanên LîS, Diyarbekir 2007

